Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1212 13-Cotmeh-2024 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Kevneşopiya Kurdî bi berhemên destan tên parastin



**Cîhan Ebdulxefûr ya bi çêkirina berhemên destan kevneşopiyên Kurdî diparêze û li dikana xwe pêşkêş dike. Cîhan dibejE, "Min berê xwe da folklorê weke hermel, şohî, şal û qewlik ên dapîrên me, çiqas ku min çêdikir ewqas kesan jê hez dikir."**

Di demên berê de jinan gelek berhemên destan çêdikirin û ew berhem di destên jinan de reng vedidan. Di kevneşopiya çanda Kurdî de teşî, destar, mîrkut, çunî û tiştên xemilandina jinan bi destê jinan dihatin çêkirin. Taybet jî ew berhem di cejnan de dihatin pêşkêşkirin. Ji wan jinan yek jî Cîhan Ebdulxefûr ya ji bajarê Qamişlo Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ye ku bi çêkirina berhemên destan dixwaze kavneşopiyên Kurdî biparêze. Cîhan berhemên xwe di dikana xwe ya bi navê Şahmaran de pêşkêş dike û di heman demê de debara xwe pê dike.

**'Min hîs dikir ku karê min bala kesê nakişîne'**

Cîhan Ebdulxefûr di serî de behsa keşifkirina jêhatîbûna xwe û çawa dest bi berhemên destan kiriye, kir û got: "Ji 10 saliya xwe ve min ji berhemên destan hez dikir, heta dema ku ez çûm dibistanê, di dibistanê de çalakiyên hunerî hebûn ez tevlî dibûm heta ez fêr bûm. Piştî ku min dibistan qedand derbasî qonaxa zanîngehê bûm, min li zanîngeha Şamê beşa hunerê xwend û derçûm. Piştre min bi fermî dest bi çêkirina berhemên destan kir. Di destpêkê de tabloyên tepî min çêdikir piştre ez çûm navenda Xabûr a bajarê Hesekê û min zarok fêrî çêkirina berhemên destan dikir. Heta demekê desteya çandê xwest dikanekê ji bo berhemên destan veke, min di wir de cih girt û bi berhemên xwe beşdarî gelek mihrîcanan bûm. Yek ji wan mihrîcana jinan bû. Destpêkê min ne dixwast karê min bala kesê bikşînê, min xwest ez tiştin cuda çêbikim da ku pir balê bikşîne û gel jê hez bike. Min berê xwe da folklorê weke hermel, şohî, şal û qewlik ên dapîrên me, çiqas ku min çêdikir ewqas kesan jê hez dikir."

**'Gel pir ji çêkirina Şahmaran hezkir'**

Cîhan Ebdulxefûr diyar kir ku ji çêkirina şohî, hermel û şalê veguherand çêkirina tiştên folklorî yên tepî û wiha berdewam kir: "Ji çêkirina şohî, hermel û şal min veguherand tiştên folklor ên tepî, weke demjimêrên tepî dema ku min demjimêrek çêkiribûya min tiştên folklorê tevlî dikir ew xweşiktir çêdibû. Şahmaran jî min çêdikir. Bi rastî milet pir jê hez dikir û dihatin dikirîn. Ji ber ku milet pir ji çêkirina Şahmaran hezkir me biryar da ku navê dikanê bikin Şahmaran. Hinek zehmetî me dikişandin ji aliyê çêkirina berhemên dest ve. Amûrên em pê kar dikin peyda nedibûn, dema ku peyde jî dibû nirxê wê buha bû. Ji ber vê yekê jî dema ku em tiştekî hazir dikin nirxê wê buha ye."

**'Divê jin xwedî li kevneşopiyên Kurdî derkevin û biparêzin'**

Cîhan Ebdulxefûr behsa beşên dikana Şahmaran kir û di her beşekî de çi kar tê meşandin û wiha bi dawî kir: "Di dikanê de du beş hene beşek a textane beşa din jî tiştê ku em amade dikin tê de pêşkêş dikin. Beşeke din heye em wê li malê bi cih dikin. Hinek jin hene dixwazin li malê kar bikin, em texta didin wan û ew li ser kar dikin. Em dixwazin di demên pêş de şaxên dikana Şahmaran li bajarên din jî vekin û ew ê berfirehtir bibe, tiştên cuda çêbikin. Di dema niha de hinek jin tên ku kar bikin ez li malê wan fêrî çêkirina karê dest dikim, ez dixwazim ji hemû jinan re bibêjim ku jin divê xwedî li kevneşopiyên Kurdî derkevin û biparêzin da ku winda nebin." **NÛ JINHA**

# Nuxşe Wehab 80'ê jinan fêrî karên destan kiriye



Nuxşe Wehab jineke xelkê Helebceye, ev 33 salin karên dest dike û heta niha 80 jin fêrî vî karî kiriye. Ew bi berhemên ku bi destên xwe çêkiriye, tevlî festîvalan dibe. Nuxşe got: "Armanca min parastina çanda Kurdiye û gelek keyfxweşim ku min kariye gelek jinan fêrî vî karî bikim."

Nuxşe Wehab di sala 1968'an de li gundê Ebabeyl yê Helebceyê hatiye dinê. Ev 33 sale karên destan dike, tiştên ciwankarî yên jinan û cilên Kurdî çêdike. Her wiha 80 jinên din jî fêrî van karan kiriye. Nuxşe Wehab û jinên ku li ber destên wî fêrbûne, bi berhemên xwe yên dest çêkirî tevlî festîvalan dibin. Îsal jî Nuxşe Wehab bi gelek berhemên xwe yên bi dest çêkirine, tevlî Festîvala Payîzê ya Kelarê bûye.

Nuxşe Wehab beriya 33 salan piştî koça xelkê Başûr a sala 1991'an, dema ji Îranê vedigere Helebceyê dest bi karên dest dike. Ji ber heskirina wê ya zêde ji vî karî re, ew heta niha jî karê xwe berdewam dike. Nuxşe bi hevkariya rêxistina Amêz 80 jinên din jî fêrî van karên dest kiriye. Nuxşe diyar kir ku gelek keyfxweşe ku kariye ji bo parastina çanda Kurdî gelek jinên din jî fêrî karên dest bike. Nuxşe li gel jinên ku wê ew fêrî karên dest kiriye, bi berhemên xwe tevlî festîvalên hunerî dibin. Di derbarê karê xwe de Nuxşe ji ajansa me re axivî û got: "Ew jinên ku min ew fêrkirine xelkê Helebceya şehîdin, me kariye şêwazê cilûbergên berê yên Kurdî bidirûn û biparêzin. Me serdana gelek cihên dirûtina cilan kirine û ji wan xwestiye ku cilûbergên Kurdî bi şêwazê berê bidirûn û çanda Kurdî biparêzin."

Nuxşe diyarkir ku wê bi berhemên xwe yên bi dest çêkirî tevlî Festîvala Payîzê ya Kelarê bûye û gel eleqeyek zêde nîşanî berhemên bi dest hatine çêkirin dide.**ROJ NEWS**

Sudoku: Bersiv 9

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 8 | 6 | 5 | 7 | 3 | 2 | 9 | 1 | 4 |
| 4 | 3 | 1 | 9 | 6 | 8 | 7 | 5 | 2 |
| 2 | 7 | 9 | 1 | 4 | 5 | 6 | 3 | 8 |
| 6 | 8 | 7 | 5 | 9 | 1 | 4 | 2 | 3 |
| 5 | 1 | 4 | 3 | 2 | 7 | 8 | 9 | 6 |
| 9 | 2 | 3 | 6 | 8 | 4 | 1 | 7 | 5 |
| 1 | 9 | 6 | 8 | 5 | 3 | 2 | 4 | 7 |
| 3 | 4 | 8 | 2 | 7 | 9 | 5 | 6 | 1 |
| 7 | 5 | 2 | 4 | 1 | 6 | 3 | 8 | 9 |

Sudoku:Pirs 10

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | | 9 | | 3 | | 7 |
| | | 4 | | | 3 | | | |
| 3 | | 1 | 4 | | | 2 | 8 | |
| | 5 | | 7 | | | | 1 | 6 |
| | | | 3 | 8 | 5 | | | |
| 8 | 7 | | | | 4 | | 5 | |
| | 4 | 8 | | | 7 | 6 | | 2 |
| | | | 8 | | | 4 | | |
| 6 | | 7 | | 4 | | | | |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Di singa diya xwe de ye:**
-Di rewşeke pir baş de ye; keyf keyfa wî ye; rewşa ku tê de jê xweştir nîne.
**Dinya xwariye:**
- Di xweşiyê de ye.
**Di zikê diya xwe de ye/ketiye zikê diya xwe:**
- Di rewşeke pir baş de ye; keyf keyfa wî ye; rewşa ku tê de jê xweştir nîne.
**Em li ezmanan li te digeriyan tu li erdê bi destê me ketî:**
- Em li deverên dûr li te digeriyan; me hêviyên xwe ji dîtina te birîbûn lê me tu bi hêsanî dîtî.
(Dema yek li yekî digere û bawer nake ku bi hêsanî bibîne, lê ji nişka ve xuya dike hingê dibêje)
**Ezê kumê xwe xwar bikim:**
- Êdî ezê rihet razim; êdî wê pirsgirêkên min nemînin.
**Gula dilê wî geş bû:**
- Keyfa wî pir xweş bû; dilê wî pir xweş bû.
Haya wî ji bayê felekê nîne:
- Keyfa wî li cih e.
**Hespê xwe bezand:**
- Li gorî dilê xwe tev geriya; ka çawa xwest wisa kir.
**Ketiye dawa diya xwe:**
- Keyf keyfa wî ye; rewşa wî pir xweş e.
**Ketiye dawa Xwedê:**
- Bi heman wateyê.
**Keyfa gurê nêr kir:**
- Pir keyf kir.
**Keyfa gurê pîr kir:**
- Bi heman wateyê.
**Keyf keyfa min e/keyf keyfa wî ye:**
- Ji bo kesên dilê wan rihet, tê gotin.
**Kumê xwe xwar kir:**
- Xwe qure kir; keyfa xwe anî; xwe bêminet kir.
**Kurmên xwe weşandin:**
- Dilê xwe xweş kir; dilê xwe rihet kir; bêhna xwe vekir.
**Kurmê xwe şkand:**
- Bi heman wateyê.
**Lêvên wî nakevin ser hev:**
- Pir keyfxweş e.
**Li ser teng û benga xwe ye:**
- Bextiyar e; keyfa wî li cih e; ji rewşa xwe razî ye; ti pirsgirêkên wî nînin.
**Li ser tiliyên xwe direqise/li ser tiliyên xwe digere:**
- Keyfa wî pir xweş e.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Dayîkên Aşîtiyê: Em ê li derdora Rêber Apo bibin xelekek ji agir




Komploya Navneteweyî ya li dijî Rêber Abdullah Ocalan 26 sal li pey xwe hiştin. Armanca wê jî tunekirina bîrdozî û felsefeya azadiyê di cîhanê de ye. Lê dengê doza azadiya gelê kurd û paradîgmeya azadiya gelan bi mezinbûna felsefeya Rêber Apo re şopa xwe li dîrokê dixe.**R-3**

## Şehîd Dilîşan Îbiş xwe gihand heqîqetê



Dilîşan Îbiş bi geşbûna agirê şoreşê, li warê berxwedanê "Kobanê" xwe berda nava têkoşînê. Herwiha di gelek xebatan de bû pêşeng û mohra xwe lê da. Herî dawî dema ku Dilîşan bi erka xwe ya rojnamevantiyê radibû, di 12`ê Cotmeha 2017'an de di encama teqandina du otomobîlên bombebarkirî ji aliyê çeteyê DAIŞ'ê ve, şehîd bû.**R-5**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1212 13-Cotmeh-2024 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

## Pêşketina jinê di qada sporê de têkbirina zihniyeta paşverû ye



Jinên ku li ser hîmên şoreşa Rojavayê Kurdistanê mezin bûne di pêşxistina kesayet û şoreşê de neman sekinî. Jinên Efrînê bi taybet piştî koçberiyê li hember pêvajoyê bûn hêza xwepêşxistinê, li ser wê bingehê li Kantona Efrîn û Şehbayê jinên ciwan xwe di nava xebatên sporê de li pêş dixin.**R-6**

## 'Pirtûka Girkê Legê mêjûya Rimêlan û Girkê Legê vedibêje'




Ebdulhelîm Lawî, da zanîn ku pirtûka wî ya bi navê 'Girkê Legê, Rimêlan' dîroka avabûna herdû bajarên kurdî digre nava xwe.**R-7**

# HEVRÎN NÛNERA HEVGIRTINA GELAN BÛ

Şehîd Hevrîn Xelef, yek ji pêşengên jin ên Şoreşa 19'ê Tîrmehê bû. Di şexsê xwe de hemû nirx û pîvanên şoreşê temsîl dikir. Tevî hemû zor û zehmetiyan bi dilsozî bi erka xwe radibû û bi keda xwe pêşketinên mezin bi dest dixist. Tevî ku 5 sal di ser şehîdkirina Hevrîn re derbas bûn, lê hîna jî kujerên wê nehatine darizandin.**R-2**



## Projeya Netewa Demokratîk riya çareseriyê ye



Endamê Meclîsa Giştî ya Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD'ê Welîd Dîngilî da diyarkirin ku şerê di Rojhilata Navîn de dimeşe, jinûvedîzaynkirina Rojhilata Navîn e.**R-4**

# Hevrîn Xelef; sembola jina têkoşer

**Dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê bi hemû rê û rêbazan pêşengên Şoreşa 19’ê Tîrmehê dikin hedef, ji çêkera aştiyê şehîd Hevrîn Xelef heta bi pêşenga Nivîsgeha Kar û Barên Edaletê û Çeksaziyê Zeyneb Mihemed rêwîtiyeke têkoşînê ya şehîdên ku navên xwe li rûpela dîrokê bi tîpên zêrîn neqişandine û bi îdeolojiya rizgariya jinan ji tevahî şêweyên koletiyê şer kir.**

**Navenda Nûçeyan**



Jinan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê destkeftiyên mezin bi dest xistin, êdî ji ber vê yekê dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê li ber têkçûyînê ne. Destpêkê ji kantona Efrînê ve di 2018’an de dest bi êrişên dagirkeriyê kirin, dûre di 9’ê Cotmeha 2019’an de êrişên dagirkeriyê li dijî Serêkaniyê û Girê Spî pêk anîn. Armanca sereke ya dagirkeriya Tirk jin bûn, da ku vîna wan bişikînin û bihêlin dev ji têkoşînê û xwesteka pêkanîna azadiyê berdin.

### Dewleta tirk a dagirker êrişî pêşengên şoreşa 19’ê tîrmehê dike

Ji rêzesûc, sûîqast û êrişên li dijî sembolên niştimanî yên Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, dewleta Tirk a dagirker bi hovîtî êrişî kesayetên jin ên ku destê wan di têkbirina çeteyên DAIŞ’ê de heye, kirin hedef. Ji lew re bi hemû rê û rêbazan hewl didin van sembolan têk bibe û tola DAIŞ’ê hilîne.

Di 12’yê Cotmeha 2019’an de, sekretera giştî ya berê ya Partiya Sûriya Pêşerojê Hevrîn Xelef tevî ajokarê wê Ferhad Remedan li ser rêya M4 ji hêla çeteyên dagirkeriya Tirk ve hatin şehîdxistin û bi cenazeya wê lîstin. Ew yek di dema êrişên dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê yên li ser Serêkaniyê û Girê Spî di 9’ê Cotmeha heman mehê de pêk hat.

Di 13’yê heman mehê de, Yadê Eqîde di encama topbarana dewleta Tirk a li ser sivîlên ku beşdarî karwanê ber bi Serêkaniyê ve çûne ku piştgiriya şêniyan û hêzên leşkerî li eniyan bikin, şehîd bû. Destkeftiyên ku jinan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêk anîn ku ji hemû jinên li cîhanê re bûn nimûne, bi kêrî dewleta Tirk a dgairker nehatin. Bi wê re jî eriş û desthilata xwe ya baviksalar û rêbazeke nû ji bo hedefgirtina pêşengên şoreşa jinan pêk anî. Di 23’yê Pûşbera 2020’an de balafireke bêmirov a artêşa Tirk a dagirker maleke sivîlan li gundê Helnicê yê li başûrê rojhilatê Kobanê bombebaran kiribû. Di encamê de du endamên Kongra Star; Zehra Berkel û Hebûn Mela Xelîl û xwediya malê Emîne Weysî şehîd bûbûn. Di dawiya Gulana 2020’an de, hate eşkerekirin ku bi dehan jinên Kurd di girtîgehên çeteyên girêdayî dewleta Tirk a dagirker li kantona Efrînê de îşkenceya cinsî û fîzîkî li wan tê kirin.

Di 25’ê Hezîrana 2021’ê de balafireke bêmirov a dewleta Tirk a dagirker navenda Tevgera Ciwanên Şoreşger a Sûriyê li Kobanê bombebaran kiribû, di encamê de 6 endamên Yekîtiya Jinên Ciwan û Tevgera Ciwanên Şoreşger şehîd bûbûn; Nûjiyan Ocalan, Viyan Kobanê, Rojîn Ehmed îsa, Merhef Xelîl Îbrahîm, Welîd Mihemed Menla Hisên û Mesûd Îbrahîm.

Di 22’yê Çileya 2021’ê de hevseroka Meclisa Til Şayir a Hesekê Sede Hirmas û cîgira wê Hind Xidir ji hêla çeteyên DAIŞ’ê û bi piştgiriya dewleta Tirk ve hatin sûîqastkirin.

Di 19’ê Tebaxa 2021’ê de, balafireke bêmirov a dewleta Tirk a dagirker navenda Têkiliyên Giştî ya Meclisa Leşkerî ya Til Temirê bombebaran kiribû, di encamê de endama meclisê ya YPJ’ê û endama Meclisa Leşkerî ya QSD’ê Sosin Bîrhat şehîd bûbûn.

Di 30’yê Gulana 2022’yan de, dewleta Tirk a dagirker bi balafireke bêmirov a biçek erebeyek li Qamişloyê bombebaran kiribû, di encamê de şervana YPJ’ê Mizgîn Botan û welatparêz Kîsra Melek şehîd bûbûn û du şervanên YPJ’ê Dicle Cûdî û Hêvîdar Dirbêsiyê bi giranî birîndar bûbûn. Di 2’yê Tîrmeha 2022’yan de, balafireke bêmirov erebeyek li gundê Til Semin ê Reqayê bombebaran kiribû, di encamê de yek ji fermandarên YPJ’ê Mizgîn Kobanê şehîd bûbû. Di 22 – 28’ê heman mehê de fermandara YAT’ê Jiyan Tolhildan, fermandara YPJ’ê Roj Xabûr û endama YAT’ê Barîn Botan birîndar şehîd bûbûn. Her wiha li Eyn Îsayê erebeyeke Hêzên Ewlekariya Hundirîn hate hedefgirtin, di encamê de 4 endamên Hêzên Ewlekariya Hundirîn şehîd bûbûn; Beşar Mihemed Elî Bozan, Cîhan Mihemed Mistefa, Sara Mihemed El Hisên û Selma Elî Mistefa.

Di 27’ê Îlona 2022’yan de balafireke bêmirov a dewleta Tirk a dagirker erebeyeke Hevserokatiya Nivîsgeha Kar û Barên Edlê û Çeksaziyê ya Rêveberiya Xweser a Herêma Cizîrê li çerxerêya gundê Til Cemal ê Dêrikê kir hedef. Di encamê de Zeyneb Mihemed û Yilmaz Şero şehîd bûbûn.

### Hevrîn xelef sembola aştiyê ye

Jinên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi jinên têkoşer derketin pêş, ji wan jî sekretera giştî ya berê ya Partiya Sûriya Pêşerojê şehîd Hevrîn Xelef e ku bû sembola aştî û berxwedanê li hember sûcên dewleta Tirk a dagirker. Armanca wê avakirina pira aştiyê û lihevkirina di navbera sazûmaniyên etnîkî yên cuda û xebata ji bo avakirina Sûriyeke demokratîk û pirrengî ya nenavendî bû. Xwedî peyama aştiyê bû û banga projeya biratiya gelan û jiyana hevbeş dikir, her wiha dengê jina azad bû. Di oxira pêkanîna aştiyê, bidawîkirina wêraniyê û parastina gel û xaka Sûriyê de têkoşiya.

Bi destpêkirina êrişên dagirkeriyê yên dewleta Tirk a dagirker li ser herêmên Serêkaniyê û Girê Spî di 9’ê Cotmeha 2019’an de, çeteyên dagirkeriyê dest bi derbekirina aramiya herêmê kir. Di roja înê de (11’ê Cotmehê), dema Hevrîn Xelef ji bo pêkanîna erka xebatê li ser rêya M4 ku berê xwe dida Qamişloyê, bi hovîtiyekê ji hêla çeteyên dagirkeriya Tirk ve hate hedefgirtin û şehîd ket. Meclisa Malbatên Şehîdan di 12’yê Cotmehê de bi awayekî fermî şehadeta wê ragihand.

### Hevrîn Xelef kî ye?

Şehîd Hevrîn Xelef ji malbateke welatparêz a navçeya Dêrikê ya Qamişloyê ye. Di 15’ê Mijdara 1984’an de hate dinê. Di dibistanên Dêrikê de dixwîne û piştre di Zanîngeha Helebê de endezyariya sivîl dixwîne. Di destpêka alûziya Sûriyê de di nava saziyên mirovî, hiqûqî û sivîl de çalak dibe û piştî wê dest bi xebata siyasî dike.

Endamên Partiya Sûriya Pêşerojê ew ji bo sekreteriya giştî ya partiyê hilbijartin. Hevrîn Xelef ne tenê parastina mafên kurdan dikir. Partiya Sûriya Pêşerojê ku Hevrîn Xelef bû alîkariya damezrandina wê, xwest xiristiyan, kurd û ereb bi hev re li dijî astengiyên jinûve avakirina herêmê bixebitin ku çeteyên DAIŞ’ê û dagirkeriya Tirk wêraniyeke mezin li her derê pêk anîbûn.

Bi rêya tevlêbûna xwe ji xebata civakî û siyasî ya li herêmê di avakirina Rêveberiya Xweser a Demokratîk a Herêma Cizîrê ya 2014’an de destek da. Di saziyên rêveberiyê de çalak bû. Xebata damezrandina Saziya Zanist û Fikra Azad a 2012’yan kir, her wiha ji damezrînerên Nivîsgeha Perwerdeya Civakî û Akademî bû.

Di 2014’an de erka cîgira Hevserokatiya Desteya Enerjiyê wergirt û piştre bû Hevseroka Desteya Aborî ya kantona Cizîrê. Di Bihara 2018’an de bû Sekretera Giştî ya Partiya Sûriya Pêşerojê ku hîna nû hatibû damezirandin. Projeya Hevrîn Xelef a siyasî li ser aştiya welatiyan bû. Ji ber wê bi çêkera aştiyê hate binavkirin. Her tim digot ew di xîtabên xwe de behsa pêkhatiyên etnîkî û olî bi giştî li Sûriyê ji Kurd, EReb, Suryan, Asûr, Ermen, Kildan, Çeçen û Tirkmen dike û banga avakirina Sûriyeke nenavendî û welatekî ji hemûyan re li ser bingeha yekîtiya gelê Sûriyê dikir.

Piştî ku şehîd bû, piranî malbatan navê Hevrîn li çekên xwe kirin. Piştî şehadeta Hevrîn Xelef komîteyek lêpirsînê ku doza siwîqastkirina şehîd Hevrîn lêkolîn bike û sûcdaran veguhêze dadgehên navneteweyî hate avakirin. Weqfa Mafên Jinan a Geşkirinê (AWID) gelek navên jinên Ereb, Amazig û Kurd tev li “Arşîva Hêviya Jinan” kir ku “jinên cîhana me guhartine” xelat û zindî bikin. Hevrîn Xelef jî yek ji wan têkoşeran e.

Şaredariya Barcetoyê ya bajarê Barma yê Îtaliya navê Hevrîn Xelef li pira çemê sar” Rio Revo Freddy” kir û wêneya wê li her du aliyên pirê daliqandin û li ser pirê “Ji bo mafên jinan têkoşiya û bi sedema îxanetê jiyana xwe ji dest da” hate nivîsandin, li gel wê jî navê wê li park, cihên giştî û akademiyên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hate kirin.



# ‘Pirtûka Girkê Legê mêjûya Rimêlan û Girkê Legê vedibêje’

**Ebdulhelîm Lawî, da zanîn ku pirtûka wî ya bi navê ‘Girkê Legê, Rimêlan’ dîroka avabûna herdû bajarên kurdî digre nava xwe. Her wiha Lawî diyar kir ku ev pirtûk mijar û navnîşanên cuda digire nava xwe û di pêşangeha Şehîd Herekol de wê ji weşanên HRRK’ê were pêşandan.**

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Berhema Girkê Legê ya Ebdulhelîm Lawî ye, berhemeke dîrokî ye û tevlî pirtûkxaneya kurdî bûye. Derbarê heman mijarê de nivîskarê berhemê, Ebdulhelîm Lawî bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

### Pirtûka Girkê Legê berhemeke çawa ye û bi çi armancê hatiye nivîsandin?

Pirtûka min a bi navê Girkê Legê-Rimêlan, berhemeke dîrokî ye, mêjûya van herdû bajaran di vê lêkolînê de hatiye nivîsandin. Ev berhem bi zimanê kurdî ye, min dîroka Girkê Legê û pê re jî ya Rimêlan vexwendiye qada lêkolînê. Min di sala 2012’an dest bi lêkolînkirin û nivîsîna wê kir. Ez di wê demê de di nav komeleyeke rewşenbîrî de bûm û ji min hat xwestin ku lêkolînekê li ser Efrînê çêbikim. Dema ku min dest bi lêkolînê kir, min dît ku gelek li ser vê mijarê xebitîne û dîroka wê weke ya hin dever û bajarên Rojavayê Kurdistanê hatin nivîsîn. Lê min dixwest dîroka Girkê Legê û Rimêlan bibe mîna van bajarên me yên ku lêkolîn li ser hatine çêkirin û dîroka wê were belgekirin. Min bi dirêjahiya salekê lêkolîn û nivîsîn bi dawî kir, li gel xwe hişt û di sala 2014’an de 150 hejmar çap kir, îsal bi saya HRRK’ê wê ev pirtûk di 8 mîn Pêşangeha Şehîd Herekol a Prtûkan de a ku wê di 15’ê Cotmehê de dest pê bike, were pêşandan.

### Qadên naveroka vê berhemê çi ne?

Pirtûk li ser gelek navnîşanan dabeş dibe û her navnîşanek mijareke û di pirtûkê de bi berfirehî hatiye şîrovekirin. Weke mijara ku Girkê Legê kengî hatiye avakirin û kîjan demê Rimêlan li kêleka wê hatiye avakirin. Li aliyekî din jî mijara gundên girêdayî Girkê Legê hatiye destnîşankirin. Di heman demê de kengî ereb ketine bajêr de, mijara lêkolînkirina dibista, dikan, dermanfiroş û hwd… vedihewîne naveroka pirtûkê. Her wih bi xetên stûr lêkolîn li ser hin kesayetan jî hatine çêkirin û hejmara rûpelên pirtûkê jî 104 rûpele. Ev brehema dîrokî, bi wêneyan hatiye amadekirin, gelek mijar hebûn ji ber ku hewcedariya wan bi wêneyan hebû, armanc jê tekezkirin û belgekirin e.

### Navê Girkê Legê ji ku hatiye û dîroka wê vedigere kîjan serdemê

Ji bo mijara navê Girkê Legê jî, me di naveroka pirtûkê de daye diyarkirin ku nav ji kû hatiye. Wekî em dizanin berê Girkê Legê girek bû, li ser wî girî darek hebû û Leg legê hêlîna xwe li ser wê darê çêdikir, lewma jî navê Girkê Legê ji vê yekê hatiye. Ji xwe navê Rimêlan ango Mabedê jî min bi çend şîroveyan sedema navlêkirina wê di naveroka pirtûkê de bi bîr xistiye. Dîroka Girkê Legê vedigere şaristaniyên ku berî hezarê salan li vê deverê jiyane. Ji ber ku gelek deverên dîrokî û şûnwar li Girkê Legê hatine dîtin, vedigerin serdema Romanî. Lê weke avabûna Girkê Legê ya ku em îro dibînin vedigere, sala 1938’an. Di wê demê de ev dever çol bû û tenê girek lê hebû. Kesê bi navê Hecî Hisênê Berekêt, Girkê Legê ava kiriye, di destpêkê de, ew û malbata xwe û xizmên xwe dema ku ji Serxetê tên Binxetê, diçin gundên Kanî Kerkê û Şêro, piştre jî tên Girkê Legê. Bi demê re jî gundê Girkê Legê mezin û pêş dikeve.

### Giringiya pirtûkên dîrokî çi ne û çiqasî pêdivî heye ku lêkolîn li ser gund, bajar û deverên kurdî di roja îro de bên çêkirin?

Em dizanin ku çiqasî pirtûkên dîrokî yên li ser gund, bajar, dever û civakê ji bo diyarkirina rastiya her civakekê girîng in, nexasim ji bo gelê kurd. Ji ber ku herêma me bi giştî hewcedarî lêkolînên dîrokî ne. Lewma jî çêkirina lêkolînên bi vî rengî dîroka gund, bajar û hemû deveran bi belge dike û wê dîrokê diparêze. Lêkolîna ku min li ser Girkê Legê çêkiriye, kevin bûye û di roja îro de gelek tişt hatine guhertin. Nimûne, ji wê dîrokê hejmara kurdên vê deverê kêmtir bûye, gelek cih hatine guhertin û ji ber rewşên cuda kurd derketine û hem jî ketine Girkê Legê. Lê belê min bi vê berhemê bingehek ji bo lêkolînerên din çêkiriye ku lêkolînên nûtir çêbikin. Di pilana min de hebû ku pirtûkeke bi heman terzî li ser gundên me çêbikim, lê derfetên min kêm in.

### Zehmetiyên ku derketin pêşiya lêkolînkirinê û jêderên ku we jê sûd girtîn çibûn?

Zehmetiya ku derdiket pêşiya min di amadekirina pirtûkê de, ji hêla wêneyên kesan ve bû. Mînak em bêjin ku, dema me lêkolîn li ser dibistanekê çêkir, di wêneyekî de, navê xwendekarekî nehat naskirin, lê piştî ger û xebateke mezin navê wî hat naskirin. Ev zehmetî nimûneyek bû, li aliyê din, di qada piratîkê de jî heta ku lêkolîn dihat kirin, min zehmetî didîtin. Yek ji çavkaniyên ku min ji xwe re bingeh girtin, kesayetên bi temen mezin ên Girkê Legê û şaredariya wê bû. Di heman demê de jî lêkolîna xwendekarekî kurd ê bi navê Hesen Şêxmûs bû, ew derçûyê zanîngeha Şamê bû. Hêjayî bi bîrxistinê ye ku wî lêkolîna xwe ya derçûnê li ser herêmê û di nav de jî Girkê Legê çêkirbû.

### Ebdulhelîm Lawî kî ye?



Ez Ebdulhelîm kurê Ehmedê Mele Silêman ê Zivingî me yê naskirî bi Ehmedlawî, di sala 1963’an li gundê Kehniya Nebî hatime dinyayê. Li wir çûme dibistana seretayî û di sala 1977’an de, malbata me li Girkê Legê bi cih bû. Her wiha li Rimêlan min dibistana amadeyî xwend û bekelorya çaksazî li Hesekê xwend, paşê peymangeh li Dêra Zorê di 1985’an de temam kir. Min nêzî 200 meselokên kurdî û gotinên pêşiyan dane hev. Lewma jî min ji helbesta kurdî hez kir û dest bi hûnandina helbesta kurdî kir. Ji salên 2007’an heta 2011’an endamê komîta amadekar a mehrecana helbesta kurdî bûm. Li Girkê Legê bûme serokê şaxê nivîskarên kurd. Di 11’ê Cotmeha 2006’an de me çar kesan li Girkê Legê Dîdargeha Girkê Legê ya Rewşenbîrî damezirand û me di wê demê de çalakî li dar dixistin. Roja ragihandina Rêveberiya Xweseriya Demokrat bi şanazî ez di nav de weke endamê Meclisa Zagonsaz beşdar bûm li ser navê Dîdargeha Girkê Legê ya Rewşenbîrî, min 5 salan di meclisê de xebat dikir.

# Çand û Hunera Amûdê rengê hunera kurdî berdewam dike

**Jîn Hisên/ Qamişlo**

**Piştî Şoreşa Rojava ji bo parastina çand û hunera gelan li seranserî herêma Bkaur û Rojhilatê Sûriyê navendên çandê hatine vekirin, yek ji van nevendan jî ya bajarê Amûdê ye ku bi kar û xebatên xwe rengê çand û hunera kurdî dewam dike.**



Mirovan bi hêsanî civakbûyîn ava nekirine. Dem û dîrokeke dirêj, mirov wekî hemû zindîwarên din takakesî jiyane. Çi ji ber şert û mercên xwezayî û çi jî ji ber jîndarên din gelek zor û zehmetiyên mezin kêşane. Her kêliya jiyanê bi dîtin, bihîstin, hest û hîsan tecrube kirine. Li gorî tecrubeyan ji bo xwe qada jiyanê ava kirin e. Bêguman ev qonexeke dûr û dirêje ku bi xwe re rê li ber şoreşên mezin vekiriye. Em ji hemû bermahiyên bi destê mirovan hatine afirandin re çand dibêjin. Çand wekî hemû berheman bi destên mirovan ji hest, raman û fikrê mirovan hildibere. Yanî hilberînek ji manewiyatê ye. Ew manewiyate ku civakbûyînê diafirîn e. Belê çand û pergelên çandî ne tenê di warê madî de, di heman demê de bi nirxên xwe yên manewî û exlaqî mirovahî û civakbûyînê pêş dixe. Di heman demê de çand di navbera mirovan de rista gihandina hev û avakirina yekitiyê dileyze. Tu pergaleke civakîçandî ji nişka ve mîna ku ji ezmanan ve hatibe, derneketiye holê. Di gelek qonaxên dijwar re derbas bûye. Di heman demê de wendabûna wê jî ji nişka ve pêk nayê. Wekî civaka kurd her çiqas di warê bawerî û çandî di çerxeke dijwar a dewlet, şaristanî û baweriyên serdet re derbas bûbin jî hêj çand û baweriya xwe ya resen dijîn. Çawa ku her civak xwedî dîrokek e, divê bê zanîn ku ew dîroka civakê bi çanda wê ya ji hezaran salan ve teşe girtiye.

Li Rojavayê Kurdistanê beriya şoreşa Rojava çand û hunera kurdî û xebatên wê qedexebû, xebatên dihatin meşandin jî bi awayekî veşartî li malan pêk dihat. Lê piştî Şoreşa Rojava li bajar û navçeyan Bakur û Rojhilatê Sûriyê navendên çandê ji bo xizmeta çand û hunera gelan hatin vekirin. Yek ji van navendan em ê behsa wê bikin jî, Çand û Hunera Amûdê ye.

### Beşên Çand û Hunera Amûdê

Di sala 2014`an de navenda Çand û Huner a Amûdê hate avakirin, bi hemû beşên wê Arşîv, Şano, Mozîk, Wênesazî bi hemû cûreyên wê, mûntaj. Herwiha Mamosteyê her beşekê hebû. Herwih dibistaneke mozîkê hate vekirin, hejmara şagirtan gihaşt 160`an, 6 mamoste li ser disekinîn, ji ber hejmara gelek kirin sê beş ( sibeha, nîvro û êvarî), di dema derçûnê de nasname belav kirin, ji van şagirtan 10 şagirt cihê xwe di navendê de girtin.

### Koma Agirî

Di çand û hunra Amûdê de yek ji komên pêşeng ku rola xwe di pêşketina nevendê de lîstiye koma Agirî ye, di sala 1986`an li çiyayê Kurdistanê hate avakirin û roja îro li Rojavayê Kurdistanê kar û xebatan dimeşîne. Gelek endamên wê şehîd ketin û gelek derketin derveyî welat. Navê Agirî hate pejirandin ji bo bîranîna şoreşa Agirî li çiyayê Kurdistanê ku li dijî zordariya dewleta Tirk di sala 1926`an de bû.

Ji damezrînerên koma Agirî Heval Kemal, Birûsk, Elî Mensûr, Ehmed Sedûn, Edul Baqî El-Omerî û Mihemed Mihdî Edul Hefîz Seîd. Beşeke ji damezrînera gihaştin asta şehadetê weke şehîd Birûsk, Ehmed Sedûn û Mihemed Ebdo li çiyayên Kurdistanê şehîd bûn.

Di dema heyî de koma Agirî çalakiyên xwe berdewam dike, ji hêla Elî Mensûr û Lîlav Elî Mensûr ve tê birêve birin. Endamên koma Agirî: Elî Mensûr, Lîlav Mensûr, Beşîr Mele helbestvane, Mihemed Yûnis lîstikvanê Baglama, Alan û Abdul Qadir tenbûrvan, Hezret lîstkvanê Nay û Qerenta, Şêro li Orgê dixe, Xoşnav Emo, Rokeş, Perwîn û Leyla dengbêjin.

Koma Zarokan heye ji hêla Mihemed Yûnis tên perwerde kirin, Koma Kûlîlkên Agirî.

Beşê wênesazî ji hêla Ismaîl Ebdo tê rêvebirin, beşê peyker Bavê Kîvara rêvedibe, Hunerên sepandî ji hêla Leyla Adul Rezaq.

Çand û Hunera Amûdê di nava bernameyeke mehane dewreyên şêwekarî, mûzîk û şanoyê bi rêveberiya beşîr Mele kar û xebat dimeşîne.

# Hogir Mihemed bi dilpakiya xwe bû lehengê çapemeniyê

Nûçegihanê Ajansa Hewar Hogir Mihemed ê ku bi dilnizmî û fedekariya xwe dihat nasîn, di oxira derxistina heqîqetê û serkeftina şervanên lehengiyê de, di 14'ê Cotmeha 2017'an de li Dêrazorê bû yek ji mûmayê azadiyê.

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

Di pêvajoya Şoreşa Rojava de gelek nûçegihan û rojnemevanên ku berxwedan şervan û kiryarên çeteyên dagirkeriyê dişopandin, şehîd bûn. Ji wan yek jî şehîd Hogir Mihemed bû ku di pêngava têkbirina çeteyên DAIŞ'ê ya bi navê Pêngava Bagera Cizîrê dişopand.

12`ê Cotmeha 2017'an de çeteyên DAIŞ`ê 2 erebe di nava sivîlên ku ji herêmên di bin serweriya rejîma Baasê de bûn, reviyabûn anku herêmên bejahiya Dêrazorê û bi rêya "Xurafî" ku Dêrazorê bi Hesekê ve girê dide, ber bi herêmên ku QSD`ê rizgar kiribûn ve çûn. Di wê demê de nûçegihanên Ajansa Hewarê Dilîşan Îbiş, Hogir Mihemed û Rizgar Denîz rewşa şer dişopand. Di encama kiryarên çeteyan de nûçegihan Dilîşan Îbiş û Hogir Mihemed şehîd bûbûn û Rizgar Denîz jî rakirin nexweşxaneya Hesekê, paşê ew rakirin nexweşxaniya Qamişlo û herî dawî jî ew rakirin nexweşxaneya Şamê da ku tedawiya xwe bibîne, lê tevî hemû hewldanên tenduristiyê da ku rehet bibe, di 18`ê Kanûnê de şehîd bûbû.



Ş.Hogir Mihemed

### Kurtejiyana şehîd Hogir Mihemed

Hogir Mihemed di sala 1991'an de li taxa Hilêliyê ya bajarê Qamişlo ji dayik bûye û di nava malbateke welatparêz de mezin bûbû. Malbata wî fikr û felsefeya Rêber Abdullah Ocalan di salên 90'î de bi rêya apê şehîd Hogir têkoşer Cûma Mihemd bi nasnav Roşer Menal ku di sala 1994`an de di nava refên tevgera rizgariya Kurdistan de û li Xerzanê şehîd bûbû, nas kirin. Malbata Hogir ji 8 zarokan pêk tê, Hogir li Dibistana Axir Zeman a gundê Xirbet Xedîr xwendiye û tevî hezkirina wî ji xwendinê re, dev ji xwendinê berda û li gel bavê xwe dest bi karê çandinî kir, da ku alîkariya malbata xwe bike.

### Hizkirina derdorê ji dilpakiya Hogir re zêde bû

Hogir di zaroktiya xwe ve bi dilpakî û hêminiya xwe dihat naskirin, ji ber vê yekê her kesî jê hez dikir, piştî dev ji xwendinê berda, bi bavê xwe re heta temenê 18'an di çandiniyê de xebitî û paşê çû leşkeriya rejîma Sûriyê. Piştî sal û nîvekê ji leşkeriyê ji aliyê rejîmê ve hate girtin û ew birin girtîgeha Sêdnaya, demekê di girtîgehê de ma û bi hemû awayan lêdan û îşkence dît. Paşê ew veguhastin qada leşkerî û di destpêka Şoreşa Rojava de leşkeriya xwe bi dawî kir.

### Hogir di hemû pêngavan de geriya bû

Hogir ji ber êş û azara di girtîgehên rejîma Baasê de dît, wekî ciwanên herêmê di destpêka şoreşê de tev li nava refên Yekîneyên Parastina Gel (YPG) bû û perwerdeyên leşkerî û bîrdozî dîtin. Paşê wekî ajokarê veguhastina çek û teqemeniyên ji şervanan re hate erkdarkirin, li ser vê bingehê bi hemû hevalên xwe re ji Serêkaniyê bigire û heta Şengalê, herwiha bajarên Dêrazorê û Reqayê geriya anku li hemû pêngavên Rojava û herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê geriya.

### Bi dîmenên xwe serkefrina şervana ji cîhanê re dida xuyakirin

Hogir Mihemed di sala 2017'an de ji ber ku dixwest kêlî bi kêlî berxwedanê bişopîne, beşdarî qada çapemeniyê bûbû, tevî ku endamekî nû lê her dixwest pêngava Bagera Cizîrê ya tunekirina DAIŞ`ê bişopîne. Şehîd Hogir li gel bi dehan hevalên xwe yên rojnamevan rastiya çeteyên DAIŞ şopand û ji hemû cîhanê re eşkere kir. Herwiha bi kameraya xwe serkeftinên şervanên QSD`ê û azara ku sivîlan li ser destê DAIŞ`ê kişandin şopand.

### Şehîd Hogir fedekarê jiyanê bû

Şehîd Hogir dilpak bû, bi sivîlan re sosyal bû û dixwest alîkariya wan bike. Dema ku li ser rêya Xurafî bû û sivîlên ku ji herêmên di bin serweriya rejîmê reviyabûn û li herêmên QSD`ê rizgar kiribûn bi cih bûbûn, Hogir bi hevalên xwe Dilîşan û Rizgar re di nava sivîlan de digeriya û êşa wan belge dikir. Lê belê çeteyan erebeyeke bombebarkirî di nava sivîlan de teqand û gihaştin asta şehadetê. Ji ber ku şehîd Hogir Mihemed ji sporê hez dikir û hevalên xwe her vexwenin avakirina tîmekê li taxê, piştî ku şehîd bû, li bajarê Amûdê dewriyek bi navê şehîd Hogir Mihemed hate vekirin.

# Pêşketina jinê di qada sporê de têkbirina zihniyeta paşverû ye

**Navenda Nûçeyan**

**Jinên ku li ser hîmên şoreşa Rojavayê Kurdistanê mezin bûne di pêşxistina kesayet û şoreşê de neman sekinî. Jinên Efrînê bi taybet piştî koçberiyê li hember pêvajoyê bûn hêza xwepêşxistinê, li ser wê bingehê li Kantona Efrîn û Şehbayê jinên ciwan xwe di nava xebatên sporê de pêşdixin.**

Yekîtiya werzîşê ya girêdatyî Desteya Ciwan û Werzîşê li Kantona Efrîn û Şehbayê, bi herikîna pêvajoya koçberiyê re ji nû ve dest bi komkirin û birêxistin kirina xebatê xwe kirin. Jinên ciwan di qada sporê de bûn beşeke sereke di nava van xebatan de, li kêlek xebat û perwerdeyên îdeolojîk bi xwesertiya xwe tîmên soprê yên Football and volleyball dan avakirin û di nava qada soprê de xwedî xebat û çalakiyên cihêwaz bûn. Di gelek festîval û çalakiyên salene de rol girtin û beşdar bûn. Têkildarî xebatê jin di nava qadên sporê de Berdevka Komîteya Jin di Desteya Ciwan û Werzîşê de Dunya Bekir ji rojnameya me re axivî.

### `Gavavêtina jinê, têkbirina bendên kevneşop yên civakan bû`

Dunya bi destpêkirina axaftina xwe re bal kişand ser girîngiya rola jinê di şoreşa Rojavayê Kurdistanê de û wiha got: "Jinên Kurd di nava şoreşa Rojavayê Kuristanê de rola jinêm pêşeng ku muhra xwe li dîrokê xistine wergirtin. Bi xweperwerdekirin û girêdanbûna wan ji xeta felsefeya Rêber APO re, dîrokeke nû ya têkoşîna jin ji cîhanê re nivîsandin. Jinê xwe di warê civakî, aborî, leşker, dîpolomasî û hunerî de rola pêşengtiyê girt û şoreşa xwe bi ser xistin. ji çirûska ku beriya 10 salan hatiye destpêkirin, kirin ronahiya ku hemû jinên cîhanê bi hemû reng, pêkhate û netewên xwe di nava xwe de girtin. Bi vê armancê jina ku dengê wê di male de nedihat bihîstin, bû dengê şoreş Jin Jiyan Azadî. Bi van armancan jinê xwe di qadên sporî de bi pêş xist. bi taybet di nava civakên Rojhilata Navîn de gavavêtina jinê di van aliyan de, têkbirina hemû qeyd û bendên kevneşop yên civakan bû".

### Li hember siyasetên dijmin xwe birêxistin kirin

Dunya diyar kir ku piştî pêvajoya koçberiyê jinên sporvan gav û xebatên mezin avêtin û wiha domand: "Armanca yekemîn piştî pêvajoya koçberiyê ya ku gelê Efrînê tê re derbas bûye, ew bû ku îradeya di Efrînê de hatibû avakirin şikandin bû. li kêlek kiryar, şer û siyasetên şerê taybet yên ku dihatin û tên kirin de, gavavêtineke nû û bihêztir di aliyê birêxistinkirin û aktîvkirina xebatê sporê bi giştî û bi taybet ya jin hate pêşxistin. Jinên ciwan li hember van siyasetan xwe di nava xebatê sporê de birêxistin kirin, ev yek bersîvek bû li hember kiryarên dijmin û siyasetên şerê taybet yê ku bi zanebûn di vê herêmê de dihatin pêşxistin de bû. Ji lewra îro jinên ciwan bi kitleyeke mezin cihê xwe di nava qadên sporî de digirin".

### Xwebirêxistin kirin û perwerde

Duniya di berdewamiya axaftina xwe de bal kişand ser xebatên ku ji aliyê jinên sporvan ve tên birêvebirin û wiha got: "Jinên sporvan xwe di nava Yekîtiya Werzîşê de di aliyên rêvebirin û piratîk de xwebirêxistin kirin. li ser asta Kantona Efrîn û Şehbayê tîmên soprê avakirin. Niha 4 tîmên footballê û 3 tîmên volleyballê hene. Her wiha lîstikên tekane weke şatranç, bîngball û lîstikên gelêrî jî hene. Di van demên dawiyê de gaveke girîng di aliyê perwerdekirina jin ji bo kontirolkirina lîstikan weke Hekem hatin vekirin, hejmarek ji lîstikvanên jin cihê xwe tê de girtin. Bê guman li ser van bingehan tûrnoveyên dem demî û yên salane bi ser navê jinên ciwan yên sporvan tên orgenîze kirin.

Li kêlek xebatên meslekî bê guman jinên ciwan tenê di nava xebatên piratîkî de namînin. Di aliyê perwerde û xweperwerdekirinên bîrdozî de bi aliyên rêxistinî û li gorî pêvajoyê bi pilansazî van xebatan didin meşandin".



Dunya bi van gotinan axaftina xwe bi dawî kir: "Bi geşedanên siyasî yên ku li ser erdnîgariya herêmê têne qewmandin re, ev hemû li ser xebatên ku têne kirin bandor dike. demên berê hejmara tîmên sporê ji viya zêdetir bûn lê ji ber astengiyên ku durpêç di ne peydakirina alavên sporî de derdikevin holê, yekser rê li ber zehmetî û kêmasiyan derdixe, her wiha di avakirina binasaziya sporê de dibe astengdar. Ji lewra li hember van siyaset û polîtîkeyên tên kirin û bi vekririna dibistanan re wê ji nû ve aktîvkirina tîmên soprê bêne avakirin".



# Dayîkên Aşîtiyê: Em ê li derdora Rêber Apo bibin xelekek ji agir

Komploya Navneteweyî ya li dijî Rêber Abdullah Ocalan 26 sal li pey xwe hêştin. Armanca wê jî tunekirina bîrdozî û felsefeya azadiyê di cîhanê de ye. Lê dengê doza azadiya gelê Kurd û paradîgmeya azadiya gelan bi mezinbûna felsefeya Rêber Apo re şopa xwe li dîrokê dixe.

**Zana Roj/ Şehba**

Komplya Navnetewî ya ku di 9 ê Cotmeha 1999 an li dijî kesayet, îdeolojî û felsefeya Rêber Abdullah Oacalan hatiye destpêkirin; 26 sal ji dewamkirina siyaseta tecrîdê li şûn xwe dihêle. Bi hemdemiya dewamkirina vê siyasetê re, tevgera azadiyê 26 sal ji têkoşîna azadiyê û têkbirina pilanên li dijî gelê Kurd; ji dijmin re şopeke ji agir hêştiye. Her çiqas sîstema tecrîd û îşkenceyê di Îmraliyê de hatibe xurtkirin, lê îradeya Rêber Apo di valaderxistina vê yekê de bi hemû hêza xwe tê domandin. Tevgera Azadiya Kuridstan jî li ser hîmên felsefeya Rêber Apo zêdetirî 50 salî ye têkoşîneke bê dorveger dimeşîne. Li ser van mîrasan ev têkoşîn kêliyên serkeftinê nivîsandine û di cîhanê de êdî doza gelê Kurd û felsefeya rêbertî ya ku di rojên îro de bi pêngava cîhanî `Ji Ocalan re azadî û ji pirisgirêka Kurd re çareserî` hatiye destpêkirin misogeriya vê îdeolojiyê ji hemû cîhanê re ragihandiye. Têkildarî kompiloya navnetewî ya li dijî rêber Apo hatiye destpêkirin, Dayîkên Aşîtiyê yên Efrînî Emîne Osman û Sûheyle Şêx Ehmed ji rojnameya me re axivîn.


Emîne Osman

### Tevgera Azadiyê dijberê sîstema desthilatdar ya cîhanê ye

Dayîka bi navê Emîne Osman di destpêkê de Komploya Navneteweyî şermezar kir û wiha pê de çû: "Rêber Apo bi têkoşîna felsefeya xwe dîrokeke nû ji gelê Kurd re da destpêkirin, me xwe di nava vê têkoşînê de dît û dest bi xebatê mezinkirina vê tevgerê kir. bi destpêkirina vê xebatê re me siyasetên hezar salî yên ku di dîrokê de li ser gelê Kurd hatine meşandin naskirin. Ev tevger li ser bingehên exlaqî û azadiyê hate avakirin ji lewra bi siyasetên dewletên serdest re nebû yek û her tim dijbertiya vê yekê dikirin. Gelê ku temenê xwe di nava vê têkoşînê de derbaskiriye û çawa ev fikir hatiye destpêkirin, dikare baş fêmbike ji bo çi komplo hate destpêkirin."


Suhêle Şêx Ehmed

### 'Em ê bibin xelekeke ji agir'

Dayîka Emîne da zanîn ku wê dayîkên aşîtiyê li derdora Rêber Apo bibin xelekeke ji agir û wiha got: "Dijminên gelê Kurd ne tenê Erdogan e, di rastiyê de em di wê zanebûnê de ku tavahî dewletên ji bo perjewendiyên xwe jiyan dikin û avairina civakeke durî zanebûn û têgihiştina azadiyê armanc dikin. Di asta yekemîn de fikrên Rêber Apo li hember van zihniyetan derket û girseya gel li hember xweparastina ji van zihniyetên netew dewlet şiyar kir, ji ber van sedeman Tirkiyê û Erdogan ji ber dijminahiya wan ya ber bi çav bi gelê Kurd re; kirin navenda dîlgirtian Rêber Apo. Giştî gelê azadîxwaz yên girêdayî xeta Rêbertî û bi taybet Dayîkên Aşîtiyê yên ku perçeyek ji giyana xwe dane, ji bo valaderxistina siyaseta komploya ku ji 26 salan ve tê domandin jiyan dikin. ger ji me bê xwestin emê li derdora îdeolojî û kesayeta Rêber Apo bibin xelekek ji agir û vê tevgerê biparêzin."




### `Komploger di pirojeya Rêber Apo de binketina xwe dibînin`

Dayika bi navê Sûheyle Şêx Ehmed jî tekez kir ku dewletên komploger tinebûna xwe di hebûna pirojeya Rêber Apo de dibînin û wiha got: "Welatên ku beşdarî kompoyê bûne, baş dizanin ku fikra Rêber Abdullah Ocalan çareserî û guhertineke radîkal ji rewş û kirîzên ku di Rojhilata Navîn de tê jiyîn e. Di encama nakokiyên hêzên hegemonîk ên berjewendiyên xwe diparêzin, tunebûna xwe di hebûna pirojeya Rêber Apo de dibînin. ji lewra di berdewamiya van nakokiyan de girtina Rêber Apo û tecrîd kirina wî ji hemû mafên xwe yên weke girtiyekî siyasî, her wiha berdewamkirina sîstema îşkenceyê û qedexekirina hevdîtinan bi rêber Apo re jêdara xwe ji van nakokî û metirsiyan digire."

Sûheyle di dawiya axaftina xwe de bang li hemû gelên Kurd û yên azadîxwaz kir ku di vê sedsala tijî bi serkeftinên gelê Kurd de, bibin hêza têkbirina siyaeta Îmraliyê û azadiya fîzîkî ya rêbertê misoger bikin.

# Hêzên hegemon bi polîtîkayên şerê taybet qirkirina çandî pêk tînin

**Amara Baran/Qamişlo**

**Koordînasyona Hîlala Zêrîn a kantona Cizçrê Bêrîvan Botan diyar kir ku hêzên hegemon bi polîtîkayên şerê taybet hewil didin ku qirkirina çandî pêk bînin û got, "**

Li metrepolan êrîşên li ser çand û zimanê kurdî zêde dibin û hêzên hegemon dixwazin çand û zimanê kurdî ji holê rabikin divî çarçoveyê de koordînasyona Hîlala Zêrîn a kantona Qamişlo Bêrîvan Botan ji rojnameya me re axivî.

### 'Stranê tirkî li ciwanan tê ferzkirin'

Bêrîvan diyarkir ku bi polîtîkayên şerê taybet hewil didin ku qirkirina çandî pêk bînin û wiha got: "Çand û zimanê gel ji bo parastina nasnameya wê pir girîng e. Dengbêjî, govend, stranbêjî û cilên bergên gelerî bi dewlemendiya ziman re xwedî kevneşopiyeke kevnar e. Hezên hegemon hewil didin ku bi polîtîkayên şerê taybet çand û ziman ji aliye ciwanan ve bidin jibîrkirin. Di bin banê bişaftinê de mûzîka Tirkî li ser ciwanan tê ferzkirin û bi zimanê kurdî axaftin hatiye qedexekirin, ev jî dibe sedem ku gelek zarok û ciwan ji çanda xwe dûr bikevin."

### 'Desthilatdar ji çand û zimanê kurdî ditirsin'

Bêrîvan di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: "Li Kurdlstanê qirkirina çand û zimanê kurdî tê meşandin. Dewletê desthilatdar dibînin ku gelê kurd xwedî li çanda xwe ya resen derdikevin û zimanê dayikê diaxivin, ev jî ji bona desthilatdaran binketineke, ew dixwezin di desthilatdariya xwe de israr bikin û çanda me qir bikin, tirsa desthilatdaran ne tenê ji aliye leşkerî de heye, tirsa wan a herî mezin ku her kurdek li çand, zimanê û hunera xwe xwedî derkeve. Ji bo ku pêşî li qirkirina çandî bên girtin jî pêwîste her kes xwedî li çand, ziman û hunera xwe derkeve. Ev huner û zimanê ku dixwazin biçeweisînin. Li hemberî vê qirkirinê sekneke îdeolojîk pêwîste, ji bo vala derxistina polîtîkayên desthilatdaran pêwîste bi çand, ziman û bi renge xwe, xwe bidin qebûlkirin. Cil û bergên bedena me heta gotin û helbestên me bibe bersiv û pêşî li qirkirinê bê girtin."

### 'Ji bo ku gele kurd bê nasname bêhile hemû rêbazan bi kar tîne'

Bêrîvan da zanîn ku hêzên hegemon şev û rojên xwe dikin yek ji bo ku gelê kurd bê nasname bihêlin û wiha dommand: "Dewletên desthilatdar yên ku dibêjin em dikarin di şev û rojekî de çi cîhên ku em bixwazin em ê têk bibin, ev jî ispat dike ku çiqas ji çand û zimanê gelê kurd ditirsin. Ziman û çanda me şoreşe, gelekî bê çand û bê ziman nikare beje ez xwadî welatim. Li metrepolan êrîş ji ber axaftina kurdî zêde dibin, ditirsin ziman û çanda me li metrepolan jî bê jiyîn. Lewra gelek şanoyên kurdî hatin qedexekirin û li dibistanên ku bi zimanê kurdî têne axaftin hemû hatin qedexekirin. Gelê me pêwîste nekeve bin bandora hêzên hegemon û di tekoşîna xwe de bi israr be."

### 'Li Rojava gelek ciwan bi şoreşê re mezin bûn'

Bêrîvan di dawiyê de bang li hemû jinên ciwan û ciwanan kir û axaftina xwe wiha qedand: "Bangawaziyamin ji bo hemû jinan û jinên ciwan her kesekî ku çavên xwe di nava şoreşê de vekirin û bi şoreşê re mezin bûn û niha jî di nav xebatên çandî û saziyên ziman de cîh digrin. Ne dewleta Tirk ne hikumeta Şamê û hemû kesên desthilatdar ku bixwazin destdirêjî bavêjn çanda me wê tucarî nikaribin çanda me qir bikin. Em wek gelê kurd herdem çanda xwe zîndî dikin û xwedî li çanda xwe derdikevin. Pêwîste her ciwanek çanda xwe ziman û nasnameya xwe nasbike. Wek Hîlala Zêrîn peymangeheke hûnerî vedikin û din av de xwendina sê salan heye her kesê ku bixwaze tevlî bibe dikare tevlî bibe."



# Projeya Netewa Demokratîk riya çareseriyê ye

Endamê Meclîsa Giştî ya Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD'ê Welîd Dîngilî da diyarkirin ku şerê di Rojhilata Navîn dimeşe jinûvedîzaynkirina Rojhilata Navîn e.

**Vîndar Roj/ Şehba**

Endamê Meclîsa Giştî ya Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD'ê Welîd Dîngilî derbarê geşedanên dawiyê yên heremê û şerên li herêmê diqewim de bersîva pirsên rojnameya me da û naveroka hevpeyvînê jî wiha bû.

**Sedema şerê di navbera Îsraîl, Hemas û Hizbulah de çiye?**

Hegemoniya navendî her sed salî piroje û siyaseta xwe diguherîne, dema ku dibîne ev piroje sûd jê wenagire, yekser dest bi pilan û pirojeyên nû dike. Di rewşa heyi de, plansaziya netew dewlet dibîne serwer nabe, li hember wê; wê pirojeya xwe biguhere. Ev yek wê çawa bêne guhertin, bê guman di cîhanê de guhartina nexşe û siyasetan herî zêde bi şer têne kirin. Îsrail di vê demê de hewil dide ku pirojeyekî nû di Rojhilata Navîn de avabike, navê wê pirojeyê jî `Pirojeya Rojhilata Navîn ya Mezin`. Yanî dabeşkirina Rojhilata Navîn armanc digirin. Rojhilata Navîn bi perçebûna wê ya heyî dixwazin hîn perçe bikin. Ji bona pêkanîna vê pirojeyê jî Israil kirin serpereştê wê ya fermî, û Tirkiyê jî erkdar kirin ku bingeha wê amede bike. Cîbicîkarê wê Erdogan e û şerkerê wê jî Binyamin Netanyahu ye.
Israil ji hemû tektîk û pilanên ku têne amedekirin ne qute. Dema Hemas êrîşî Israil dike û sînoran radike, teqez Israil dizanî. Gelo Israil dizanî Îsmayîl Heniye di kuderê deye û ger Israil tektîka herî xeternak û zirav ya teqandinên di nava Hizbullah de pêk tîne. Israil texmin nedikir wê Hemas di 7'ê Cotmehê êrîşî wan bikin. Israil bi zanebûn di siyaset û rêbazên ku di vê dawiyê de hatine kirin tevger kir. Ev şer tenê weke derfetekê ji xwe re pêk anî, da ku Hemas ji binî de rake û tunebike. Hovîtiya ku Hemasê di rojên destpêkê de pêk aniye bê guman bi zanebûn ji aliyê Israilê de li ber nehat sekinandin. Israil di navnetewî û navendên biryaran de ev kert bi kar anî û got ev e rastiya Hemasê û Muslimanên Tûndrew. Ji ber wê jî destek û piştgirî ji navnetewî girt û êrîşî Hemasê kir. Em ji bîr nekin ku du dewletên herêmî hene yek jî Tirkiyê ye û ya din jî Îran e. Tensîqekî gelek xurt di navbera Israîl, Tirkiyê û Îranê de heye, di pilanên wan de ev yek hevbeş e, yanî dema ku Îran bi awayekî ne bi rêk û pêk bombayan diavêje û Tirkiyê dibêje em bi gelê Filistînê re ne û çima Israîl êrîş dike? Li ser van bingehan pirojeya guhartina Rojhilata Navîn hatiye destpêkirin û Israil piştî jiyankirina 70-80 salî ji dorpêça Ereban wê na pejirîne,ev rewş wisa bidome. Dewletên Ereban tu têkiliyên xwe yên aborî, siyasî û dîplomasî bi Israilê re çênakin, ji lewra Israil di dawiyê de wê bi zorê vê yekê bîne meydanê, dewleta ku bi Israilê re danûstandinan neke wê di Rojhilata Navîn de neyê qebûl kirin. Yanî hebûna xwe wê li ser hemûyan feriz bike. Yek ji wan aliyên ku Israil qebûl nakin jî Hemas, Hizbullah û Sûriye û komên Cîhadî ne.
Bê guman armanc ji vê yekê heye ew amanc jî guhartina nexşeya Rojhilata Navîn e, nexşeya ku di peymana Sayks bîko de hatiye kirin me got êdî têra hegemoniyê nake wê şekil û şêwazekî din derxînin holê. Ji bo wê nexşeya heyî wê bê guhartin, û di oxira wê de wê gelek dewlet û alî têk biçin. Em werin aliyê qebûlkirina civakî, ecaba Israil bi vê hişmendiya xwe wê di nava civakên Ereban de bê qebûl kirin? Helbet ji bo vê yekê şêwaz û pirojeyeke ku Israyî bihata qebûl kirin diviyabû, lê di encam de ew jî pêk neanî û gihîşt encama ku şerê ku îro pêk tê.

**Israil bi êrişên dawî yên ser Lubnanê dixwaze çi peyamê bide cîhanê?**

Peyama Israilê ji vî şerî ew e ku bibe navenda biryardariyê ya Hegemoniyê, di vê sedsalê de armanca wê ev e. Di vê sedsala heyî de cihê navenda hegemoniyê Israîl, Biritaniya û Emerîka bûn, lê em ji bîr nekin ku aliyekî din yên weke Rûsya, Çîn, Hindistan û Kurya Başûr hene. Bi vî şerî Israil dixwaze di sedsala pêş de jî xwe mayînde bihêle.
Bi xetên stûr pevçûna di navber Israil û gelên herêmê de xwe disipêre mijarên olî û dîrokî, rûxmî ku her du jî ji yek jêderê derketine lê bi fikarên tund ev dijminahiya di navber Cihû û Îslaman de tê berdewam kirin. Guhartina vê yekê helbet ne hêsane xwe disipêre zêdetirî 1400 sal, ger Israil dixwaze qezencekê bigre divê di siyaset û nêzîkbûnên xwe yên bi dewletên Rojhilata Navîn re guhartinan çêbike. Lê berûvajî wê Israil bi teşeyekî herî hovane xwe dide pêşkêşkirin.
Ji ber van piratîk û zihniyeta Israil ya tund wê nikaribe tiştekî qezenc bike, gelek piojeyên aşîtiyê û wekheviyê ku dikarin werin piratîzekirin. Israil hezkirina gel û civakên Rojhilata Navîn qezenc nekiriye, ji ber wê bi nêrîna min wê tu qezencê ji vê şerî neke.

**Çiqas ev rewş dikare bandorê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê û Rêveberiya Xweser bike?**

Rêveberiya Xweser, piroje û paradîgmeya ku li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatiye rûnişkandin; di qirika hêzên cîhanê û yên hegemonîk weke striyekê ye. Çi geşedanên siyasî û leşkerî di vê sedsalê de têne kirin divê em ji bîr nekin bi pirûjeya Netewa Demokratîk re nabin yek û li dîjî wê ne. Ji lewra ev modêla heyî ya ku hatiye avakirin tavahî cîhan li hember wê disekine û armanca wan pûçkirina vê pirojeya ku yekemîn care tê pêşkêş kirim û bi ser dikeve ye.
Çima dixwazin pêşiya vê yekê bigrin? Her kes baş dizane ku ev pirojeya mirovahiyê yê ku li ser bingeha exlaqî û azadiya civakan û wekheviyê hatiye avakirin, li tavahî Rojhilata Navîn û cîhanê deng vedaye. Ev şerê ku tê kirin jî yê desthilatdarî û berjewendiya ye, wê yekser li pêşiya vê pirojeyê bisekinin.



Şerê li hember pêşiya vê pirojeyê bê kirin, wê ne bi şerê germ û leşkerî be. Hêzên Bakur û Rojhilatê Sûriyê li pêşiya terora herî mezin di cîhanê de sekinî û cîhan li beramberî xeteriya DAIŞ'ê parast. Vê rastiyê hemû rayedar û hêzîn navnetewî dizanin. Ji lewra nikarin bi hêsanî êrîş bikin, lê di cewher de tunebûna vê pirojeyê hedefdigrin. Perşebşûna ku hêzên navnetewî di cîhanê de dane avakirin, Rêveberiya Xwere wan komî hev dike û pirojeya herî exlaqî pêk tîne. Li ser van bingehan dijminahî û pevçûnan bi riya Tirkiyê û hin aliyên din dixwazin bidin avakirin. Tenê rûyê dijminahiyê yê berbiçav Erdoxan derxistine pêş.

**Çareserî wê çawe pêkwere?**

Weke çawa ku heyv û tav eşkere ne, çareseriya van pevçûnan jî li Îmraliyê û pirojeya Rêber Abdullah Ocalan e. Ji lewra hegemoniya cîhanî tecrîda li ser Rêber APO giran dikin û nahêlin ku ji zîndanê derkeve. Pêvajoya heyî pêvajoya pevçûn û tunekirina gelan e. Her kes dizane yê ku serweriyê li ser rojhilata Navîn bike wê serweriyê li ser tevahî cîhanê bike. Lê çareseriya hemû pirsgirêkên Rojhilata Navîn û cîhanî bi serketin û piratîzekirina Pirojeya Rêber APO ya ku azadiya jin, avakirina civakeke siyasî û axlaqî wê pêkwere.

# Qanûna Erdoganê dagirker!

**Volqan Elî**

Na! Wisa nefikirin. Eşqiyayan, tecawizkaran, hovên dagirker, talanker û hwd. van hemûyan jî li gorî xwe qanûnek wan, rêzikek wan heye. Heta dizan jî, ku her kes bi wan dizane, qanûneke wan heye. Mînak ti diz, eşkere eşkere, bi rojê, yan jî li ber tava heyvê çavê xwe bernade tiştekî. Her xwe li benda tariyê digire da ku ti kes wî nebîne. Werhasil, nebêjin "ev faşîst e, ev dagirker, jixwe dewleta wan jî ne ti dewlet e, hemû mafya ne" û hema wisa derbas nebin. Qanûneke wan, destûreke wan jî heye. Me dixwest bêyî ku em pê de kûr biçin, hema em bikevin nava mijarê. Lê hin mijarên wisa hene ku tu ji dîrokê, ji erdnîgariyê û civaknasiyê behs nekî û mînak nedî, mirov nikare daxwaza xwe bîne ziman.

Mijara me, mijûlahiya me jî di esasê xwe de dagirkerî ye, dagirkeriya dewleta Tirk e; dewleta talanker ku dapoşa faşîzmeke bi navê Erdogan-Bahçelî daye ber sûret-sufatê xwe ye.
Mînaka ku em ê ji dîroka eşîr û qebîleyên Turanî bidin, ji vê faşîzma Erdogan-Bahçelî re îro bûye wekî qanûn. Qebîleyên Turanî-Tirk, di sed sala 9. dest pê dikin êrîşî Rojhilata Navîn, Îran û Kurdistan dikin. Ev mijarên dîrokê têra xwe kûr û bi êş in. Lê ji me re tenê ev pêwîst e ku qanûna faşîzma Erdogan di wan serdeman de dest pê kiriye were hûnandin.
Piştî hatina destpêkê ya van eşîr û qebîleyên Turanî, şer û ceng û talankerî ji Îrana jorî bigire heta bi Erebîstanê ti car li ser van erdan xelas nebûye. Hin caran kêm, hin caran jî wekî hatina Moxolan pir bi êş... Êlên Turanî, bi xweşî nehatine pêşwazî kirin. Yan jî erdnîgariya hatine li ser ne vala bûye. Werhasil, bi şer û şorî xwe bi cih kirine. Lê hin caran jî dema ku nekarîne xwediyên van erdan têk bibin, bi wan re li hev kirine. Vaye di encamê de qanûna ku Erdogan îro li ser dimeşe ji wan deman ve maye. Mînakek herî dîrokî ku faşîstên Tirk pir jê hez dikin û pê pesna xwe didin heye: Ez ne şaş bim artêşên Tirkên Turanî di şerê Mewarul Nehr dema têk diçe-yan jî ji bo ku bi ser bikevenizam kîjan padîşah yan jî serdarê Selçûkî dibêje "min xewnek dîtiye em Turanî hemû bûne Misilman" yanî stratejî yan jî qanûna Tirkên Turanî jê pêde wisa şikil girtiye: "destê ku te nekariye badî, maç bike li ser eniya xwe dayne". Yanî êlên Tirkên Turanî bi şev kafirkî ketine xewê û sibê jî Misilman rabûne! Sedem: gelên herêmê Misilman in û bi vê kafirbûnê li ser van erdan nikarin nanekî jî bixwin.
Ka lê binêre Erdoganê fatihê Rojhilata Navîn, xwêrxazê gelê Filîstîn(!) (Haniye piştî ku ji Tirkiye çûye Îranê, Îsraîlê ew kuştiye û kuştina Nasrallah jî piştî têkiliyên Hakan Fîdan çêbû ) piştî ku Tirkên Turanî bûne Misilman bi hezar salan çi kir. Ber bi dawiya meha Îlonê li DYE'ê civîneke NY'ê hebû. Qaşo rayedarên hemû dewletan li wê derê bûn. Erdogan jî... Vê carê di binê çengê wî de nexşeya Rojava xuya nekir. Yan jî me nedît. Lê wekî ku me gotiye ew qanûna bav û kalên xwe dubare kir. Çi got? Em dizanin weke navê xwe wî gelek tişt gotiye. Vaye ya herî balkêş ev bû: "Me li gel Bidin ti civîn plan nekirine, lê em li Benda Esad in". Dibe ku yek bêje "ma çi pê ve heye, hevokeke dîplomatîk a ji rêzê ye". Çawa were şîrovekirin jî, ew qanûna stratejîk a ku li ber çema Mewaraun Nehr çêbûye tê bîra mirov: "Destê ku te nekariye badî, maç bike li ser eniya xwe dayne". Maneya vê çi ye? Dagirkeriya Tirk a bi pêşengiya Erdogan-Bahçelî li ber Kurdan ewqas tengav bûye ku eger Beşar Esad Xiristiyan bûya, ji bo pê re li hev bike, îhtimal hebû vê carê hemû Tirkan bike Îsawî. Û bi ser Kurdan de were. Ya din jî: Dijmin e û li gorî xwe qaşo biaqile. Rowanşa DYE'ê -bersiv- ji bo derewa ku kiribûn ku DYE û ew ê civînekê li dar bixin, dide. Maneya "me li gel Bidin ti civîn plan nekiriye" ev e. Ka ew Erdoganê ku par-pêrar ji devê wî beled û berq vedidan, digot "Ey Emerîka, ey Ewrûpa..." ma te par-pêrar li Tirkiye ji devê xwe jehr dibarand li ser Emerîk û Ewrûpa (!), tu niha di hemêza wan de yî. Eger zilamê gotina xwe bî, bêje ji wan re çi dibêjî. Na! Dîplomasî heye! Dîplomasiya bav û kalan: "destê ku te nekarî badî, maç bike".




# Şehîd Dilîşan Îbiş xwe gihand heqîqetê

Dilîşan Îbiş bi geşbûna agirî şoreşê, li warê berxwedanê "Kobanê" xwe berda nava têkoşînê. Herwiha di gelek xebatan de bû pêşeng û mohra xwe lê da. Herî dawî dema ku Dilîşan bi erka xwe ya rojnamevantiyê radibû, di 12`ê Cotmeha 2017'an de di encama teqandina du otomobîlên bombebarkirî ji aliyê çeteyê DAIŞ'ê ve, şehîd bû.

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Dilîşan Îbiş di 26'ê Îlona 1993'an de, li gundê Hilinc ê bajarê Kobanê di nav malbateke welatparêz de ji dayîk dibe, ji malbata xwe fêrî heskirina welat bûye. Malbata wê ji sê keç û şeş lawikan pêk dihat, ew jî di nava malbatê de, di rêza heftan de bû. Dilîşan di sala 1999'an li dibistana Muhaddath a Kobanê dest bi xwendina xwe ya seretayî kir. Di nava dibistanê de bi nermbûn û jêhatîbûna xwe ya di xwendinê de dihat nasîn, lewam ji hêla heval û mamosteyên xwe ve pir dihat hezkirin. Li dibistana Shreha xwendina xwe ya amadeyî berdewam kir û li dibistana Khansa dibistana amadeyî bidawî kir. Dilîşan Îbiş di karê xwe de pir cidî bû û alîkariya her kesî dikir, lewma her kesê ku wê nas dikir jê hez dikirin. Di sala 2011'an de xwendina xwe ya amadeyî bi dawî kir û berê xwe da bajarê Halabê, da ku di enstûtiya Birêvebiriya Karsaziyê a Zanîngeha Helebê bixwîne. Lê di sala 2012'an dema pola duyemîn a Enstîtûyê dixwend li Rojava agirê şoreşê geş dibû û wê nedikarî xwe li Helebê bigire, lewra dev ji dibistanê berda û ji bajarê Helebê derket.

**Şoreş destpêka jiyaneke nû bû**



Dilîşan Îbiş bi kelecanek mezin berê xwe da Kobanê û beşdarî nav xebatên şoreşa Rojava bû. Despêkê di nava karê rêxistinê yê di çarçoveya konfederasyona xwendekarên Kurd ên neteweyî de cîh girt. Ji wê demê ve beşdarî hemî xwepêşandanên ku li bajarê Kobanê ji bo azadî û rûxandina rejîmê hatibûn organîzekirin bû. Di 19'ê Tîrmeha 2012'an de şahidiya destpêkirina şoreşa Rojava kir ku li wê derê şahiya azadiyê û derxistina rejîma Baas ji bajêr dijiya. Herwiha ev di jiyana wê de despêkek nû bû. Di heman demê de têkoşîna xwe di rêxistinkirina xwendekaran, perwerdekirin û naskirina wan a bi şoreşê re xurt kir.

**Dilîşan nûçegihana eniya berxwedanê**

Piştî salekê ji vekirina Radyoya Dengê Kobanê ku di 11'ê Mijdara 2012'an hatibû avakirin, Dilîşan di sala 2013'an dest bi karê rojnemevaniyê kir, da ku dengê şoreşê bighîne hemû cîhanê, di Radyoya Denê Kobanê de xebitî. Di despêkê de, weke pêşkêşvaniya nûçeyên zimanê Erebî kar kir. Piştî çend heyvan çeteyên Cebhet El Nusra û DAIŞ'ê êrîşî gundên rojhilatê Kobanê û bajarê Girê Spî kirin. Dilîşa di wan êrişan de weke nûçegihanek şer eniyên berxwedanê şopand û nûçeyên berxwedana Yekîneyên Parastina Gel (YPG) û Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) li pêşberî êrişên çeteyan gav bi gav ragihand. Wê bi fermandar û şervanan re hevpeyvîn pêk anî û gelek bername li ser pêşdeçûna şoreşê amade kirin. Piştî demekê ji xebata nûçegihaniya şer vegeriya Radyoya Dengê Kobanê. Lê vê carê ew ne weke pêşkêşvaniya nûçeyên Erebî bû, dest bi amadekirin û pêşkêşkirina bernameyên siyasî kir û hevalên xwe yên di Radyoya Dengê Kobanê de li ser awayê pêşkêşkirina bername û nûçeyan perwerdekirin. Di 15'ê Îlona 2014'an de dema çeteyên DAIŞ'ê êrîşî kantona Kobanê kirin, carekdinê berê xwe da enîyên şer, ji enîyên rojhilat, rojava û başûr nûçe dişopand, li kêleka wê jî pêşkêşvaniya nûçe û bernamên siyasî jî berdewam dikir.

**Dilîşan mohra xwe li gelek xebatan da**

Bi hevalên xwe re li avahiya Radyoya Dengê Kobanê ya ku 5 km dikeve rojavayê bajarê Kobanê man. Dev ji karê xwe bernedan heya ku rûbera di navbera wan û çetên DAIŞ'ê de ji 1 km kêmtir bû paşê cihê xwe berdan. Di wê demê de bi hevalên xwe re neçar man biçin bajarê Kobanê û li bajar man heya ku di 5'ê Cotmeha 2014'an de çete ketin nav bajarê Kobanê û êdî sivîl nedikarîn li bajêr bimînin. Dilîşan Îbiş û komeke hevalên xwe qebûl nakin ku ji Kobanê derkevin lê ji ber dijwarbûna şer ew neçar dimînin derbasî Bakurê Kurdistanê bibin. Dema wan sînorê Bakurê Kurdisatanê derbas kirin, rayedarên Tirk ew girtin, di saloneke sporê ya girtî de ew binçav kirin û nehiştin ku derkevin derve. Ji ber vê yekê Dilîşan bi hevalên xwe re 13 rojan ket girava birçîbonê, lewma rayedarên Tirk neçar kirin ku wan serbest berdin. Piştî ku serbest hatin berdan, Dilîşan vegerya kantona Cizîrê û karê xwe dewam kir.

**Bi tena xwe xebatên Dengê Kobanê da meşandin**

Piştî ku Dilîşan gihişt kantona Cezîrê, ber bi bajarê Qamishlo ve çû, ji despêka mijdara 2014'an heya 26'ê Çileya 2015'an rizgarkirina Kobanê di rêveberiya Radyoya Dengê Cûdî de xebat dida meşandin. Piştî rizgarkirina Kobanê bi çend rojan vegerya Kobanê û ji nû ve dest bi vekirina Radyoya Dengê Kobanê kir. Di sibeha 13'ê Adara 2015'an de Radyoya Kobanê bi yek endam ew jî Dilîşan bû, dest bi kar kir. Wê ji nû ve endam li ser xebatên radyo û pêşkêşvaniyê perwerde kirin. Gelek ked kir da ku Radyoya Dengê Kobanê vegerîne asta wê ya berî êrîşên çeteyên DAIŞ'ê. Herwiha Dilîşan di 25'ê Hezîrana 2015'an carekdin bû nûçegihana şer û ji bo şopandina pêngava rizgarkirina bajaroka Sirînê yê ku di 27'ê Tîrmeha 2015'an de hat rizgarkirin kedek mezin da. Ji bo di karê xwe de hîn zêdetir pirspor bibe çû perwerdê û du mehan di perwerdê de ma. Dema perwerde qedand, bû nûçeghana televîzyona Ronahî TV. Di nava du heyvan de gelek raporên taybet amade kir. Piştre dîsa vegerya Radyoya Dengê Kobanê.

**Dilîşan li ser şopa rêhevalê xwe soza berdewamiyê da**

Dilîşan Îbiş di dawiya sala 2015'an de berê xwe da bajarê Qamişlo û bû nûçegihana Ajansa



Hawarê. Demekê weke nûçehan li bajêr xebitî, paşê xwest bibe nûçegihana şer. Li ser daxwaza xwe li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê dest bi şopandina pêngava ji bo azadiya deverên dibin destê çeteyan de kir. Despêkê tevlî pêngava rizgarikirina gundewarê Başûrê Kobanê bû ku 23'ê kanûna 2015'an despêkir û bi rizgarkirina bendavê re di demek kurt de gihiştî encamê. Di heman demê de, ew beşdarî şopandina hamleya rizgarkirina bajarê Minbicê bû ku 1'ê Hezîrana 2016'an dest pê kir. Li gel nûçegihanê Ronahî Mustafa Mihemed pêşveçûna pêngava rizgarkirina gundên Minbicê û piştre bajar û serbestberdana sivîlan ji destê çeteyên DAIŞ'ê bi hev re dişopandin. Ji ber vê yekê windakirina Mustefa bandoreke mezin li ser wê kir û soz da ku riya wî berdewam bike da ku rastiyê nîşan bide.

**Dilîşan mîrateyeke dewlemend li pey xwe hişt**

Dilîşan Îbiş pêngava rizgakirina bajarê Reqayê şopand û di her 5 qonaxên wê de cihê xwe girt. Destpêk pêngava Xezeba Firatê ya ku di 5'ê Mijdara 2016'an despê kirî, pişre jî di qonaxên mayî de heya şer gihişt hundurê bajarê Reqayê di çarçoveya pêngava rizgarkirina bajêr a 6'ê Hezîrana 2017'an despê kir. Di 9'ê Îlona 2017'an de pêngava Bahoza Cezîrê despê kir. Ji bo rizgarkirina Herêmên Cezîrê yên mayî û perava Rojhilatê Firatê, li gel her du hevalên xwe yên nûçegihanê Ajansa Hawarê Rizkar Adanmîş û Hawker Mihemed bi hev re dişopandin.
Herwiha di 12`ê Cotmeha 2017'an de hêzên QSD`ê komek sivîl ji herêmên di bin dagirkeriya DAIŞ`ê de rizgar dikin. Dilîşan Îbiş li gel hevalên xwe Hogir Mihemed û Rizgar Denîz diçin gel koçberan da ku rewşa wan bişopînin. Di wan kêliyan de çeteyên DAIŞ`ê bi teqandina du otomobîlên bombebarkirî li ser riya Xerafî ya ku dikeve navbera Dêrazorê û bajarê Hesekê komkujiyê pêk anî. Di encama teqîna de Dilîşan tevî 14'e sivîlên din şehîd ketin. Rizkar û Hawker jî digel 73'ê kesên din birîndar bûn. Dilîşan li goristana şehîd Dijle ya bajarê Kobanê hat veşartin. Piştî wê bi 3'ê rojan Hogir ji ber ku bi giranî birîdar bibû jiyana xwe ji dest da. Herwiha di 18'ê Çilê 2017'an de Rizkar ê giran birîndarbûyî jî jiyana xwe ji dest da. Dilîşan ji bo armanca ku berê wê da xebatên çapemeniyê canê xwe feda kir û wekî gelek jinên fedekarê derxistina rastiyê mîrateyeke dewlemend li pey xwe hiştin.